# GUNDÎ

# YEKBİN...!

Institut kurde de Paris

1981

K.L. 139

Institut kurde de Paris

LIV. K.L. 139(2

# GUNDÎ

10/07/2018
922 GUN YEK

# YEKBİN..!

Institut kurde de Paris

INSTITUT KURDE DE PARIS
ENTRÉE N° 724

**1981**

D Î Y A R Î..

Bo karvana kewandina birînan
Karvana serketin û newrozan
Karvana jîyan..
Dîyarî bo h e v a l a n.

Gundî

Institut kurde de Paris

# P Ê Ş G O T İ N

Di vê pêşgotinê da ez naxazim li ser helbestan bisekinim, ev karê rexnevanaye, lê ez dixazim çend gotinan li ser çarçoyên helbestan yên dîrokî bêjim û bîrûbawerî ya xwe bi kurtî li ser rola huner û wêje bi tevayî û li ser rola helbestvan, nivîskar û hunermendên kurd bi taybetî dîyarkim. Ez çend gotinan derbarê zimanê kurdî jî pêwîst dibînim.

Piştî 6-7 sal dûrbûn ji welat min dest bi nivîsandina van helbestan kirîye û çawa ez rewşa xwe ya taybetî (şexsî) bi doza netewî va girêdayî dibînim, wisa jî hevgirêdana doza netewî û ya navnetewî jî dibînim.

Di helbestan da min gelek caran gotîye dayîk û her carê jî dayîka min hatîye pêş çavên min. Her carê navên welatan jî hatine, Kurdistan

Institut kurde de Paris

bûye perda birînan di rûyê min da.
Min tu caran jî bawernekirîye, ko azadîya gelê me ji azadîya gelên Rojhilata Navîn û ji azadîya hemû gelên cîhanê bêye birîn.
Ez xwe welatparêz dizanim, lê ez ne netewperestim.
Ez hemû netewan wekhev dibînim û heya ji min bê ezê li dijî dest-dirêjîya neteweke li ser neteweke dî rawestim.
Bi vî awayî ezê tu caran li hem-bera zordarîya li ser gelê kurd bê deng nemînim.

Ji alîyekî din va em baş zanin, ko hin çîn û tojeyên civakî ji netewê kurd li dijî azadîya gelê me ne û bûne maşa di destên zordarên Kurdistanê da.
Şerê me bi wan ra heya nemana wane.

Armanca me ji azadîya gelan ne tenê kişandina sînorên welatan û bilindkirna ala netewîye.
Armanca me rizgarkirna mirov ji



Institut kurde de Paris

birçîtî..nezanî..mexaşî..
ji zordarîya aborî..civakî..
sîyasî..çandîye.
Armanca me wekhevîya gelan
wekhevîya jin û mêran
wekhevîya gund û bajaran
û wekhevî û yekbûna karê bi dest
û karê bi mijîye.

Em pêşketinê dixazin.
Em aştîyê dixazin.
Em dixazin kuştin..lêdan..zîndan
xûnmijî..kedxûrî ji cîhanê rabin.
Em dixazin neweyên diwaroj van
gotinan tenê di ferhengan da..di
pirtûkan da..di filman da binasin.
Bila ew bi nemirovanîya dema me
bikenin..
Bila ji hev bipirsin: Çima bav û
kalên me goştê hev dixarin..??

Em hevkujîyê naxazin.
Em biratîyê dixazin.
Bila dilşadî..cejn û newroz konê
xwe vegrin..cîhanê hembêzkin...

Institut kurde de Paris

Seba ewrên reş ji hev werin belavkirin..seba zevîyên qehwê..zevîyên birincê neyên şewtandin..seba dîsa ji donê mirovan sabûn neyê çêkirin.. dako Hîroşîma serî hilnedin..pirnebin...
pêwîste kes bê deng nemîne..
pêwîste her kes şûrê xwe rake û di têkoşînê da beşdarbe..
pêwîste azadî..aştî..bajarvanî..
diwaroj werin parastin.

Di vê rêya dûr û dijwar da hunermend..helbestvan..nivîskar..zana.. fîlosof gîyanê (rihê) karvanê xebatê ne..
minarên bilindin..
çirayên geşin...

Yê ko berpirsîyarîya xwe nasî û bi kar û barê xwe rabû, cihê xwe di dilê gelê xwe da..di dilê mirovayetîyê da girt.
Lê yê ko rola xwe nenasî, tenê jîyana xwe derbaskir..jibîrbû û çû.

Institut kurde de Paris

Barekî giran tê ser milên hunermend û nivîskarên kurd jî.
Ev welatê xaş wek gulistan û ev gelê kevnar û qehreman gelek caran bûne kêla nîşana dijminan..
Kurdistan gelek caran bûye meydana talan û xûnrijandinê, û
aborîya Kurdistan
Civaka Kurdistan
Çanda Kurdistan...
ketine bin nîrê bîyanîyan,
û rêya pêşketinê windabûye...

Îro jî Kurdistan perçe perçeye..
birîndare..di bin nîrê bîyanîyan da ye..
li rêya pêşketinê..
li rêya azadîyê..
li rêya serketinê digere.

Û eger serpêşîya tevgera kurdî ta sala 1975an di destên axan, şêxan û melan da bû, lê ew niha ji wê bergehê derbasbûye yan jî derbasdibe. Ev çend salên dawî dema zelalbûna ramanan û cudabûna hêzan bûn. Zelalbûn hên jî berdewame.



Institut kurde de Paris

Dîyare, ko her bergeheke dîrokî li gor tenga pêwendîyên aborî û civakî raman û rêxistinên xwe yên sîyasî jî dertîne.
Îro civaka Kurdistan di dema hejandina bingehî..di dema guhartin û nûhkirinê da ye.
Ji bo ev doza guhartinê bi baştirîn şêwe..bi serfirazî biçe serî, gereke pireyên bi stûnên polatî werin amadekirin.
Bê hestîyê piştê mirov nikane rabe ser xwe. Hestîyê pişta tevgera azadîxaza gelê kurd karker, cotkar, ronakbîrên şoreşger û hemû welatparêzên kurdin, û stûnên ji polêt jî rêxistinên şoreşger û pêşengîne.
Ji vir da karê nivîskarên kurd destpêdike, û ji vir da jî barê giran têye ser milên wan.

Nivîskarên kurd
Helbestvanên kurd
Hunermendên kurd
Zanayên kurd..di amadekirna pirên polatî..pirên serketinê da beşdar



Institut kurde de Paris

bin..asoyan ronbikin..zengilan
lêxin...
Di nav rêzên karkeran da..di nav
rêzên cotkaran da..di nav komên
gel da bi bêhneke fireh..bi sebir..
bi dûrbînî çira xwe hildin..bê
rawestan rêya nîşandin..hêvîyan
belavkin.

Kurdistan ne tenê bi cografî kane
bibe dilê Rojhilata Navîn..
Kurdistan kane di warê sîyasî da
jî bibe dilê Rojhilata Navîn..
Lê pêwîste em şîyarbin..
em zanabin..em yekbin..
pêwîste em lawên demê xwe bin.

Bo zimanê kurdî ez dixazim van go-
tinan bi vê bangê destpêbikim:
(Ronakbîrên kurd xwe bidin pêş..
binivîsin..bi kurdî binivîsin..
di hemû beşên zanistan da binivî-
sin..)

Çiqas kêmanîyên nivîsandinên me
hebin jî pêwîste em bi zimanê xwe
binivîsin.



Institut kurde de Paris

Ez baş zanim, ko gelek heval hene kanin bi zimanên din ji zimanê me asantir û baştir binivîsin, lê weke Ehmedê Xanî gotîye: Ma mirov zaroyê xwe yê nexaş bi zaroyê cîranan yê xaş diguhêre..?

Bi firehbûna tevgera kurdîya sîyasî ra tevgera hunerî, wêjeyî û çandî jî firehdibe û berxwedide, ji sînor û barên şûnmayîna dirêj rizgarbibe.

Zordarîya li ser Kurdistan çanda me di tengeka nizim da hêştîye. Û çawa çanda neteweke wê pêşva here, eger li şûna mamostan ji wê ra cendirman dişînin..eger li şûna xwendegehan ji wê ra zîndanan avadikin..û eger gotina: "Ez kurdim" heya di dawîya sedsala 20an da cirmeka mezin tê hejmartin..??

Lê tenê qehremantîya gelê me ya bûye histirîyê di çavên dijminan



Institut kurde de Paris

da, zimanê kurdî li nav newal û çîyayên Kurdistanê parastîye.

Tunebûna dewleteka kurdî pirsa pêşvabirna ziman û çanda kurdî dijwardike û li şûndihêle.
Lê eger em di binê zîndanan da bin jî, pêşvabirna vê dozê barê me ye û pêwîste em xudanên doza xwe bin.
Li gor kanînên xwe û qasî gavên em kanin bavên gereke em tu caran ranewestin. Dendikên em îro biçînin wê siba bibin dar û ber bidin.

Ev kara jî beşeke ji beşên şoreşa diwaroj, na ev kara beşeke ji beşên şoreşa îro jî.
Şoreşa civakî..şoreşa, ko kanibe civakê biguhêre, ne di rojekê da destpêdike û ne bi gavekê jî diçe serî û ne jî bi bêhnekê wek tavên biharê derbasdibe.
Şoreş zincîreka gelek dirêje ji hezaran kar û barên dijwar li hemû tengan û bi gelek şêwan.
Ji welatparêzên rast jî têye xas-



Institut kurde de Paris

tin, ko bê rawestan..bê ax û of qulpên zincîrê amadekin û bihevxin.

Zimanê kurdî li şûnmaye ev raste, lê dilê xwe zîndî maye..xaşe, ew jî rêzimana kurdîye.
Gotinên erebî, tirkî di **zimanê me da pirin,** û pir caran gotinên zanistî û nûjen bi kurdî nayên dîtin, nemaze di zaravê kurmancî da. Ev jî encama (netîca) rewş û dîroka gelê me ye.

Carna hevalin dibêjin: Bi zimanê gundîyan binivîsin.
Ev gotina çiqas xaş jî têye bihîstin, lê bi bîrûbawerîya min dîtineka zor tenge.
Eger em bixazin çîrokan yan stiranên gelêrî binivîsin yan di tenga elêfbayê da bimînin, zimanê gundîyan wê têrê bike. Lê eger em bixazin çanda kurdî pêşva bibin û pirtûkxana kurdî bi lêkolîn.. lêgerîn..wergerandin dewlemendbikin di hemû beşên zanistan da,



Institut kurde de Paris

wek wêje, huner, dîrok, cografya, sosyolojî, psîkolojî, kîmya, fîzya, hendese, felsefe, doktorî... û her weke dî - û bi bîrûbawerîya min ev xasteka tevgera me ye ji îro da -, zimanê gundîyan zor hin dike û nikane vî barî rake.
Gelek girînge, mirov zanibe çi û bo kê dinivîse.
Bi kurtî ez dixazim bêjim, weke hemû doz û pirsên civakê ziman jî ji zemên nayê birîn. Ziman jî pêwîste bi zemên ra gavke.

Eger tenê li tenga zanîna gundîyan were nivîsandin, zimanê me wê di cihê xwe da bimîne, ji ber ko piranîya mezin ji gundîyên me bê xwendinin, û zanîna mirovê nexwen dî ji sînorên gund û navçeya wî derbasnabe.

Rakirna nexwendinê û pêkanîna şoreşa çandî bi firehî û bi bername di sînorên welêt giştî da wê di dema serketina şoreşê da pêkbê.
Wisa li Kûba..li Angola..li Mozem



Institut kurde de Paris

bîq..li Nîkaragwa û berê li Yekîtîya Sovyêtî û welatên sosyalîst çêbû, û wisa jî wê li Kurdistanê çêbibe.

Bêguman **dibê** em bi çavekî bilind li nivîskar û zanayên xwe temaşekin, lê karê heya niha çêbûye zor kême li gor xastekên tevgera me di bergeha teze da.
Dema me dema şoreşa zanistî û têknolojîye li cîhanê giştî. Ew bandora xwe dide jîyana gelê me jî û merc û xastekên nuh peydadike. Li gor van guhartinan pêwîste tevgera me jî di hemû waran da karbike.

Bo dema me ya îro çend tiştên bingehî hene pêwîste em li ser bimînin û têxin kar:

1- Zaravên zimanê kurdî ji hev bibin û hevdû zengînbikin û bere-bere berve yekîtîya zimên herin.
2- Ji ber ko zimanê kurdî ji malbata zimanên îranîye, pir gotin di van zimanan da weke hevin ya



Institut kurde de Paris

ji hev zor nêzîkin. Em kanin gelek sûd (fayde) ji zimanên îranî wergirin.

3- Gotinên bîyanî di zimanê me da eger bi rastî cihê xwe girtibin, pêwîste bimînin. Lê bona hevalên dixazin di pêşvabirna ziman, wêje û çanda kurdî da karbikin, ez pêşneyardikim, ko xwe bi zimanên erebî, tirkî û farsî jî mijûlbikin. Bo pêşvabirna zimanê me ev arîkarîyeka hêjaye.

4- Bo gotinên zanistî teze yên li pir welatan belavdibin em jî kanin wergirin û zimanê xwe pê dewlemendbikin. Lê ne weke tir kan, ko zimanê xwe kirine nîv fransî. Pir caran tişt hene bi zimanê netewî baştir tên dîyar kirin, û mirov baştir têdigehê.

5- Çêkirna gotinên nuh di zimanekî da ne kêmasîyeke, belkî hên xurtbûna wî zimanî nîşandide. Eger mirovê wan gotinan bihevdixe, çêdike û belavdike, zana be û têgehîştîbe, wê kanibe ge



Institut kurde de Paris

lek arîkarî bide zimên û bi zanis
tî pêşvabibe.
Ne bi şêwakî otomatîkî gotin werin çêkirin, lê bi pirskirin ji gel ji zimannasan..bi lêgerîn..bi lêkolîn di pirtûkan da..di ferhengan da.. di helbestan da û bi lêgirtin bi zimanên din va.
Gotinên hêja wê cihên xwe di nav zimên da bigrin û yên ne rast wê bikevin û cihnagrin.

Binivîsin..binivîsin..di hemû be
şên zanistan da binivîsin...
Tenê di nivîsandinê da zimanê me wê pêşva here û dewlementir bibe, û zaravên xwe wê bervehev werin û di diwaroj da yekbin.

Bo navê dîwanê ez fikirîm, û pir nav hatin pêşîya min wek:
Rêya Newroz..Vaye Rê..Banga Ser-
ketin..Elêfbaya Serketin û gelek navên dî.
Lê min kûrtir bala xwe dayê..
min dî bê yekbûn..
rê naçin serî..

Institut kurde de Paris

serketin çênabin..
newrozên rast nayên...
Loma min ji banga: <u>Y E K B İ N</u>
baştir tişt nedî.

Di rêxistinên şoreşger da yekbin
Di enîyên nîştimanî da yekbin
Bi karkerên hemû welatan û gelên
bindest ra yekbin.

G u n d î

20.2.1981

Institut kurde de Paris

## BENDEWARİM...WERİN

Ba û bahozên hên ji dayîk nebûne
Hêdî hêdî
Ji derd û êşên bindestan
Ji nalînên girtîyan
Ji ax û ofên birçîyan
Ji xûna şehîdan
Ji hêstirên çavên sêwîyan
Ji têkoşîna welatparêzan
Bi çav dibin
Bi dest dibin
Bi ling dibin
Dixuşin
Dimeşin
Dibezin
Tên
Tên
Di rê da tên

Wek leşkerên Spartekus
Wek çovê Mûsa
Wek çakûçê Kawa
Wek partîya Lênîn
Wek Oktobera mezin
Dixuşin
Dimeşin

Institut kurde de Paris

Dibezin
Tên
Tên
Di rê da tên

Çîya bi derdin
    Bi kulin
    Dinalin
    Dihejin
    Ax..emin hustixar
        Emin bê xudan
        Pezê bê şivan
        Çîyayên Kurdistan
        Çîyayên Kurdistan

Girtîme...werin
Birçîme...werin
Bê navim...werin
Bê mafim...werin
Birîndarim, hustixarim
Bendewarim, bendewarim

Werin...leşkerê sor
    Çakûçê Kawa
    Partîya Lênîn
Werin...bendewarim...werin

9.9.1977



Institut kurde de Paris

## RÊYA AZADÎ

De naske kurdo rêya xwe naske!
Ji bo azadî
Dilxaş û şadî
Gelên cîhanê tevda azadbûn
Bûne xudî qad, bi rist û rêzin
Nemane çêla şîr jê didoşin

De naske kurdo rêya xwe naske!
Ji bo wekhevî ne jêr û jorî
Ne jî zengîn û birçî û têrî
Ne kes bindestî, ne kes zordestî

De naske kurdo rêya xwe naske!
Heval û dostan ji bo xwe komke!

Te xûn rijandî bê tirs û bê pirs
Ji bo çîna jor ya tirk û faris

Burjiwazên kurd nokerên dijmin
Berdestên dijmin, dijminê dostin
Welatfiroşin, dijminê kurdin

De naske kurdo rêya xwe naske!
Ji bo azadî
Dilxaş û şadî

Institut kurde de Paris

Xûna xwe merjîn ji bo nokeran
Nokerên dijmin, dijminên kurdan!

De rabe kurdo serê xwe hilde!
Biçirîn bendan..!
Bişikîn qeydan..!
Welêt rizgarke, bajar û gundan!
Ji bo azadî
Dilxaş û şadî

Noker ditirsin ji karkerên kurd
Dijmin ditirsin ji **vê rêya rast**
Rêya karkerên hemû welatan
Rêya wekhevî, bê bend û zîndan

Ji bo azadî
Dilxaş û şadî
Ji bo welatan
Ji bo mirovan
De naske kurdo rêya xwe naske!
Zîn li hespêke, deman derbaske!
Barê xwe rake, dozê serrastke!

28.3.1978

Institut kurde de Paris

# MEBÊ KANÎ LAWÊ MİN

<u>Dîyarî</u>:

Bo hemû dayîkan
Bo dayîkên lawên dûr
Bo kanîyên evîna kûr

Dayê her carê tu serê sibê
Piştî şevên tarî
Bi dilxaşî
Yan bi xem û tirs
Ji xewa şêrîn
Ji xewnên xaş û geş
Yan ji xewnên pîs û reş
Rabûyî serxwe,
Megere li min!
Merjîne hêstiran!
Mebê kanî lawê min!
Dayê bipارêze hêstiran
Bona cejn û şahîyan!

Dayê eger dilê te teng bû
Eger dewat û şahîyên gundê me
Dengê def û zirnan
Çûn û hatina mêvanan
Xwendekar û mamostan
Keç û xortan
Civînên hevalan,
Hêrsa dilê te rakirin...

Institut kurde de Paris

Dayê eger pirsa min hat
Eger pêlên keseran...
Rabûn û dahatin
Pencerên derd û kulan vekirin,
Dayê mebê ax!
Megere li min!
Mebê kanî lawê min!
Merjîne hêstiran!
Dayê biparêze hêstiran
Bona cejn û şahîyan!

Dayê em naxazin bimînin dûr
Ji welatê birîndar
Ji gelê bindest
Ji bihara çîyan
Ji newroz û şahîyan

Dayê eger pirsa min hat
Hêrsa dilê te rabû,
Megere li min!
Dest bide ser birîna welat!
Dayê her carê eger pirsa min hat,
Mebê kanî lawê min
    Tîra dilê dijmin!
Dayê bipirse li çêrûka welat!
    Li karvana sîwarên Rojhilat!

Institut kurde de Paris

Dayê eger pêlên keserên dilan
Hejîn û kelîyan
Rabûn û dahatin
Zincîr çirandin,
Mebê kanî lawê min!
Megere li min!
Bipirse li azadîya gelê bindest!
Biçîne gulên sor!
Bide dest hevalan...
Welatparêzên rast!

Dayê metirse ji şevên tarî!
Ji xewnên pîs û reş!
Mebê ax!
Merjîne hêstiran!
Biparêze hêstiran
Bona cejn û şahîyan!

Dayê em namînin li asoyên dûr
Li pişt sînoran
Li pişt deryan û çîyan
Dayê em namînin nama bê nav û nîşan
Welat namînin li bin ala neyar
Hustixar û birîndar
Em jî namînin bê rê û dost û yar
Em tên...
Dayê em tên
Serfiraz em tên

Institut kurde de Paris

Emê çêkin şahîyan
Li ser çîyan
Emê bişewtînin tarîyan
Emê xewnên reş têxin gornan
Emê biherkînin hêstiran
    Roja gulên sor
    Roja hevalan
    Roja şahîyan

Dayê em tên
Serfiraz em tên
Serbilind em tên

28.9.1978

Institut kurde de Paris

## "MAFÊN MİROVAN DİPARÊZİN"

Mepirsin ji ku tên çekên kuştin û
Talanan!
Mepirsin ew diçin ku!
Ma birîndikin sîngê deryan
Yan kavildikin bajar û gundan
Mepirsin..!

Mepirsin xûna kê tê rijandin!
Mepirsin gelo dayîkên kêne
Zaroyên kêne
Reşin yan sipîne
Mepirsin..!

Mepirsin li kune bazarên çekan!
Mepirsin kîne firoşkarên kefenan!
Mepirsin li rengên xûnmijan
Reşin yan sipîne
Mepirsin..!

"Ew mafên mirovan diparêzin"
"Ew barên ketî hiltînin"
"Birçîyan têrdikin"
"Tazîyan bi kinc dikin"[1]...

---

1- Propaganda Karter ya derewîn.

Institut kurde de Paris

Gotinên wan rastin yan derewin
Mepirsin..!

Mepirsin li elêfbaya çekan!
Li nîşana çekan!
Gelo îngilîzîne
Amrîkîne
Fransîne
Îtalîne
Almanîne
Mepirsin..!

Bipirsin ji gornên kuştîyan
Ji komên sêwîyan
Ji bazirganîya mirovan !
Bipirsin ji zêr û zîvê Afrîka jêr!
Ji titûna Rodîsîya..fosfata Sahra!
Ji şekirqamîşê Havana!
Ji qehwa Amrîka jêr!
Ji bêderên mozan!
Bipirsin..!

Bipirsin ji pêtrola erebî!
Ji çemê Amazon!
Ji kenala Siwês!
Ji Qods..ji Tel-Ezze'ter
Ji Beyrût..ji welatên birîndar
Bipirsin..!

Institut Kurde de Paris

Bipirsin ji sêwîyên Tebrîz!
Ji kolanên Tehran!
Ji bindestîya Kurdistan!
Ji tî û birçîyan!
Ji xas û tazîyan!
Bipirsin kî li wan dike
Kirasên ji agiran!
Kî serxoşdibe bi hêstirên wan!
Kî didize parîyê devê birçîyan!
Bipirsin..!

Bipirsin ji talankaran!
Ji xûnmijan!
Ji mirinfiroşan..kuştinperestan!
Çima ditirsin ji vulkanên xezeban?
Ji yekbûna bindestan?
Ji raperînên gelan?
Bipirsin..!

Nav tên guhartin
Cih tên guhartin
Mirinfiroş li pir welatan
Dibin mêvan
Elêfbaya çekan jî tê guhartin
Navnîşan jî tên guhartin
Carna ji rojhilata Etlesî tên
Carna ji rojavaya Etlesî tên

Institut kurde de Paris

Lê xûnmijî..kedxûrî
Li nav titûna Rodîsîya
Li welatê Vîktor Xara
Li nav çîyayên Dêrsim
Li kargehên bomba Nêyutronî...
Bi yek rengîye
Bi yek navîye..

Nav tên guhartin
Reng tên guhartin
Cih tên guhartin...
Lê doza belengazan
Li hemû welatan
Bi hemû zimanan...
Bi yek rengîye
Bi yek navîye..

26.10.1978

Institut kurde de Paris

## POLAT TÊ AVDAN[1]

Li welatê birçîyan
Li nav newal û çîyan
Birçî bûm
Tazî bûm
Lal bûm
Ker bûm
Bê çav bûm
Erê...
Ez bê çav bûm

Min serî hilda
Gerîm...
Li kamîya derdan
Nezan bûm
Nezan bûm

Ji tizbîyên şêxan
Ji zimandirêjîyan
Ji nivîstokên wan
Min bawerdikir
Azadî hêvîdikir
Min derd û kulên har
Birînên dijwar...
Dikirin xew..bencdikirin
Dunya, ko tê..min bazardikir

Institut kurde de Paris

Lê weke mar bê cehir nabin
Zordar jî bê qamçî nabin
Hevalbendin
Cêwîne...
Ez nezan bûm
Ez nezan bûm

Min serî hilda
Gerîyam...
Li kanîya derdan

Wek mizgîna ji dûr
Wek vebûna derîyên zîndanan
Wek cejn û şahîyan
Min dî
Min dî
Dermanê derdan min dî
Rêya azadî
Min dî

Di tarîya şevan da
Peydabûm
Tî..birçî..nezan
Mezinbûm
Lê çawa polat di agirê sor da
Germdibe
Sordibe

Institut kurde de Paris

Xortdibe
Tê avdan
Wisa hevalbendên şoreşan
Bi hêstir û birînan
Bi dijwarîyan
Bi zîndanan
Têne avdan
Polatim
Hevalbendê şoreşim

18.3.1979

1- "Çawa polat hate avdan" sergotina çîroka nivîskarê sovyêtî yê bi nav û deng Nîkolay Ostrovskîye.

Institut kurde de Paris

## MAFÊ MİROV..
## KUŞTİNA SOLOMON MALANGU[1]

Dadgeha wan jî eşkere got:
"Tu bê sûcî"
Ji hemû alîyên cîhanê
Xastek bilindbûn
Rizgarîya te ji mirnê hêvîkirin

Wana tu kuştin bidarvekirin
Ey zaroyê belengazên Afrîka-Başur
  Xortê ciwan
  Solomon Malangu

Gornên karkerên Şîkago[2]
Li te dipirsin
Kavilên Song Mêy[3] li defê dixin
Bandikin:
"Ey şoreşgerên cîhanê jibîrmekin
Hatina dizan
Kuştina mirovan
Jibîrmekin"

Em biçûk bûn li Amûda[4] serbilind
Li nav xanîyên ji axê
Li Kurdistana Sûryê
Me dît çawa dijminên mirovan
Sînema arkirin

Institut kurde de Paris

Zarok şewtandin
Dayîk li hev civîn
Hêstir barandin

Solomon Malangu
Sînema Rêks li Abadan[5]
Tola şewtandîyan
Îna-Reş
Bi hezaran kuştî
Bajar û gundên Îrana nûh
Bêsûcîya te dibînin
Dengê te dibîsin
Dijminê te dinasin
Xûnxarê mezin
Bû rovîyê gurî
Ji welêt bazda, revî
Erzanbûye e'yarê wî
Dere..tê..destnakeve cî

Bazirganên kefenan
Xûnxaran..
Li gelek bajar û gundan
Kon vekirin
Kuştin çandin
Kefen firotin

Institut Kurde de Paris

Dayîka Solomon Malangu!
Jibîrmeke birînên dayîkan li
Santîyago[6]..!
Litrê şîr!
Dengê Vîktor Xara!
Dest bavêje Tel-Ezze'ter[7]
Perdê rake ji komên laşan!
Megrî..!
Dayîkên birîndar
Pirin..bê hejmarin

Dayîka Solomon!
Dayîkên birîndar!
Şoreşgerên cîhanê!
Hemû dijminên firoşkarîya kefenan!
Hemû dijminên dizan û xûnmijan!
Werin destên xwe bidin me
Em bigerin li Kurdistanan
Li nav newal û çîyan!
Em bipirsin ji Diclê..ji Ferêt!
Em xwe berdin binanîya Beh'ra Wanê
Bigerin li hestîyên mirovan!
Em herin Gelîyê Zîlan
Bipirsin ji xûna sor li ser zinaran!
Em dakevin kûranîya keseran!
Em bipirsin ji gornan
Ji gornan..!

Institut kurde de Paris

Gelo kîne firoşkarên kefenan
Dijminên dayîkan
Dijminên zarokan
Dijminên dengbêjan
Dijminên gelan...?!

Şoreşgerên cîhanê..hevalên me!
Werin em herin Meraşa Qehreman[8]
Em bixûnin ji ser dîwaran
Em bala xwe pêdin şeqam û çarşîyan!
Wê ji me re vekin girêka birînan
Wê bi bîra me wînin karkerên Şîkago
Kavilên Song Mêy
Birînên Santîyago
Dijminên dayîkan
Dijminên zarokan

8.4.1979

Institut kurde de Paris

1- Nijadperestan ew di roja 6.4.79 de bidarvekirin.
2- Karkerên, ko yekê Gulanê bi wan têye nasîn.
3- Gundeke li Vîyêtnamê. Împêryalîstên amêrîkî hemû rûniştvanên wî gundî, jin, mêr, kal, pîr û zaro dane ber qurşînan, kes ji wan

xaş nehêştin.

4- Li Amûdê şovînîstên sûrî sala 1961 weke 150 zaroyên xwendegehê şewitandin û gotin: Sînema bi xwe şewitî. Wan yên birîndar jî bê doktor û dermankirin hêştin.

5- Mirovên SAVAK ew şewtandin û dora 600-700 mirov têde şewitîn. Wan bi dêmagojî belavkirin û gotin: Komûnîstan sînema şewtandin.

6- Santîyago paytextê Çîlîye. Litrê Şîr jî Unîdad Popular (Berya Gelî) dida zaroyan, lê junta faşîst ew ji ser wan birî. Junta dengbêjê bi nav û deng Vîktor Xara jî kuşt.

7- Navçeyeke Beyrûtê ye felestînî lê rûniştibûn. Faşîstan dorgirtin û dane ber gulên topan. Piştî 53 rojan û piştî kevir li ser kêvir nehêştin faşîstan standin. Mirovên xaş mabûn ji ber tî û birçîbûnê êdî hew kanîbûn şerbikin.

8- Li Qehreman Meraşê berî çend mehan faşîstên Tirkîyê milet dane ber qurşînan û weke 140 mirovî kuştin.



Institut kurde de Paris

# ÎRAN..YA DAWÎYA 1001 ŞEV[1]

Ez dûr bûm
Bi hezaran kîlomitir
Ez dûr bûm
Lê roj bi roj
Gav bi gav
Dilê min bi we ra bû
Min dixast dest têxim destên we
Dengê xwe bilindbikim
Rûyê xwe bidim qurşînan
Bibim jimarek ji milyonan
Pêlek ji pêlan
Min dixast ez bibim
Leşkerekî nenas
Di çêkirna şoreşê da
Ez dûr bûm ji karkeran
Ji gundîyan
Ji komên gelan
Ez dûr bûm ji meydana mêran
Ji Î r a n...

Îro jî dilê min bi we ra ye
Pozbilindîya Fêrewn min dî
Serdaxistina ceneralan..
Wezîran..
Nokeran..

Institut kurde de Paris

Destmaçkirna xûnxar..min dî
Xûna sor
Bêderên laşan
Yekîtîya bindestan..min dî

Xûşka sosyalîst..Mahîn
Bo dermankirna birînan
Bo wekhevîya jin û mêran
Bo biratîya gelan
Bo azadîya erd û esman..
Tu dermanî
Xûşka Mahîn..tu hatî
Tu diwaroja welatî
Tu hêvanê şoreşa Rojhilatî
Tu qehremanî..serbilindî
Pîrozbî li Îran
Li Kurdistan
Li Rojhilatan

Dayîka xwendevanê dûr
Dayîka Mahîn
Dayîka xûşk û birakan
Tu dayîka min bû
Xwendevanê dûr..ez bixwe bûm
Gotinên te..dengê dayîka min bû
Min jibîrkir, ko ez dûrim
Bi hezaran kîlomitir ez dûrim

Institut kurde de Paris

Karkerên gernas hatin
Gundîyên belengaz hatin
Ajotvanên hişyar hatin
Xwendekarên zana..
Jin..mêr..
Kal..pîr..
Xort..keç..
Zaro..hatin

Dîwaran gotin..şoreş
Şeqaman gotin..şoreş
Li gundan..şoreş
Li bajaran..şoreş
Dar..ber
Ba..baran
Erd..esman..
Bi yek dengî..şoreş..şoreş

Welat jor..jêr
Rojhilat..rojava
Bû yek..bû yek

Çiqas xaşe serketina şoreşan
Gelên bindest..
Karkerên hemû welatan..
Yekbin..çêkin şoreşan!

19.4.1979

Institut kurde de Paris

1- Navê filma filmkarê îranî Mas'ud Ehmed Rajaî bû. Vê fîlmê raperîna zehmetkêşên Îranê ji alîyekî va û pozbilindîya nûnerên civaka kevin ji alîyê din va nîşandan.
Rajaî bergehên şoreşê pêşkeşkirin û bi hunermendîyeke zor hêja dija yetîya civakî di rojên xwepêşandanên milyonan da xiste pêş çavên me.
Şah û mala wî, wezîr, ceneral, SAVAK û noker li alîyekî û Îran gişt li alîyê din.
Di nimûneya keça şoreşger û sosyalîst Mahîn û dê û birayên wê da, ko ne yek bîrûbawerî bûn, lê hemû di xwepêşandanan da beşdardibûn, Rajaî yekîtîya gel pir baş nîşanda.
Rola Mahîna sosyalîst du armancên mezin dîyarkirin, yek rizgarîya jinan li Îran û li Rojhilat giştî û yek jî pêwîstîya sosyalîstîyê ji welatên me ra.

Institut kurde de Paris

## BO Çİ NALÎN Û GİRÎ..?

Ey felek ez qet nanalim
Bo çi nalîn û girî..?
Wane dewranên jîyanê
Çi li jor bî çi l' jêrî

Ger nebûna zulm û zorî
Xûnmijîn û berberî
Çawa çerxa vê cîhanê
Wê bigîşta vî berî?!

Bo nemînin zulm û zorî
Xûnmijîn û berberî
Bo nêrgiz her serbilindbin
Bê nalîn û bê girî
Bo gulîk û bilbil şabin
Ronya aştî bibarî...
Ala azadî bilindkin
"Vê dozê bibne serî"[1]

16.6.1979

1- Ev malka li gor va malka Cegerxwin hatîye çêkirin:
Kes bi lavlav û bi dîlek
vî berî nabin serî

Institut kurde de Paris

## EGER MİN BİGOTA: AX...

Dibêjin mirov carekê dimre
Ez dibêjim eger raste:
Ma çawa di hefteyekê de
Ez du caran mirim?!
Û berê jî ez gelek caran mirime

Lê ez baş dibînim
Bi şûrên darî serketin nayê
Ez baş dizanim
Bi parsê
Bi hustixarî
Bi ax û of...
Şûrên ji polêt peydanabin

Erê gelê bindest
Eger şûrên me ne ji polêt bin
Bihar nayê welatê me
Gul û nêrgiz bilindnabin

Hevalekî rêya me ya dûr
Ji me re dibêje:
Herin bidin pê ala bi heyv û stêrk
Ala sorbûye ji xûna ermen û kurd
Dibêje: Herin bidin pê ala Atatûrk

Institut kurde de Paris

Hevalekî dinî rêya me ya dûr
Ji me re dibêje:
Destên xwe dirêjkin kevneperestîya kurdî
Bi hev re bibin yek

Eger carekê tenê were bîra min
Ko ez bêjim: Ax
Ezê bêjim: Ax ji van şûrên darî

Eger demek bihata
Û min zanîba
Ko gelê bindest
   Gelê xas, tazî, birçî
   Gelê nezan...
Wê guhdarî min bike
Wê min ji xwe re çavgirtinekê
Tenê çavgirtinekê
Pêxember zanibe
Minê bigota:
Peydake şûrên ji polêt
Ey şoreşvanên gelê bindest yekbin
Xwe bidin pêş...
Metirsin
Winin şûrên ji polêt
Êdî bibin partîyên ji polêt
4.10.1979

Institut kurde de Paris

## EM DARA JÎYANÊ DIÇÎNIN

Dereng
Gelek dereng
Em tên dunyayê

Li gelek welatan
Hevalên me berê dara jîyanê diçinin
Lê em...
Em gelek li paş karvanê mane
Nû em dara jîyanê di van rojan da
diçînin
Neweyên me bendewarin

Em dereng tên
Em li paş karvanê mane
Lê bi xaşî
Bi reşî
Bi jîn
Bi mirin
Em xudanê rêya xwe ne
Doza me ne sêwîyê ber destane

Em xwe di ser sîya xwe re çenakin
Em dest navêjin heyv û histêrkan
Em ava deryan naçikînin
Em şevan nakin roj

Institut kurde de Paris

Rojan nakin şev
Tenê em pencerên xwe vedikin
Reş û sipî ji hev dikin
Dost û dijminan nasdikin
Rêyan dîyardikin
Dara jîyanê diçînin
Ji neweyên xwe re diçînin

Bi tavên biharê
Bi bîst û yekê avdarê
Bi her zinarekî
Bi her qehremanekî
Bi dilpakîya zarokan
Bi xûna şehîdan
Me sondxar
Me sondxar bi mayîn û neman
Bi şoreşvan û şoreşan:
Doza me namîne bêxudan
Goga ber lingan
Sêwîyê ber destan

8.10.1979

Institut kurde de Paris

## TU PEYDANEBÛYÎ Jİ BO BİNDESTÎ...

Tu kanî qeydan bişikînî
Zincîran biçirînî
Erd û esmên bilerzînî

Tu kanî serî hildî
Serfiraz û serbilind bî
Xwenas û baz û qehreman bî

Tu kanî xudî maf bî
Xudî mal bî
Xudî Dicle û Ferat bî

Tu kanî rênas û rêzan bî
Xudî rêxistin û rist bî
Parêzkarê deşt û çîya bî

Tu kanî neyar û dijminê neyar bî
Dost û hevalê heval bî
Dîsan siwarê Rojhilat bî

9.10.1979

Institut Kurde de Paris

## EM JÎ HESTÎ Û GOŞTÎN

Kêr kane me birînbike
Agir kane me bişewtîne
Av kane me daqultîne
Û eger em ji kêvir bin
        Ji hêsin bin
        Ji polêt bin...
Û bawerîya me
        Ji kûranîya dilê me da
        Ji her dilopeka xûna me da
        Ji tamar û hestîyên me da
Bi rastîya doza me netê
Bi rastîya rêya me netê
Bi me netê...
        Em bi sernakevin

10.10.1979

Institut kurde de Paris

# BERDÎN BAZÎRGANÎYA DEREWAN

Ha hû tim pozbilindin
Ha hû tim xweperestin
Dema kesan çû
Dem bû tevayî
Tarîyê barkir
Herder ronahî

Armanc dîyare
Rê jî dîyare
Gotinan mecûn
Mekin miz-mizî
Rasteçep meçin, mekin derewan

Koma dilsar û qels û revokan
Bêjin, çi dixazin, weke mirovan

Ev pozbilindî
Ev xweperestî
Ev rasteçepî...
Hemû derewin
Tev derd û kulin

30.11.1979

Institut kurde de Paris

## DİJMİN Û BİRÎNA MİN

Dijminê min jibîrmeke
Ez jî weke te ji hestî û goştim!
Ne ji dêrim
Ne ji kêvirim
Ez jî bi çavim
Ez jî baş dibînim
Ez ne bê hişim
Ez ne bê dilim

Dijminê min..!
Bi xûna birîna min
Serxoşmebe
Zaroyan xudanmeke
Baxçan mexemlîne
Dest li sîngê xwe mexe
Simbêlan bamede
Mêvanên xwe li dor birîna min
kommeke..mecivîne !!

Birîndarim
Lê ez xaşim
Ne kuştîme
Ne mirîme
Ez baş dibînim

Institut kurde de Paris

Pepila te li ser sîngê mine
Nênûkên te di birînên min de ne
Dikolin
Kûrdikin...

Dijminê dilreş!
Dijminê hov!
Dijminê xûnxar jibîrmeke
Rengê xûna min
Xemlandina baxçên xwe
Civandina mêvanan li dor birîna min!
Jibîrmeke serxoşbûna xwe bi xûna
Birîna min!
Jibîrmeke û zanibe
Ez xaşim..
Ne kuştîme
Ne mirîme!
Çîrokên birînan dirêsim
Ji karvanên azadî dermanê
Birînan dipirsim

Dijminê xûnxar baş zanibe
Min rêya serketinê dît
Min karvan naskirin
Ez ne bê dengim
Ez şoreşa birînan perwerdedikim

Institut kurde de Paris

Mezindikim
Digehînim
Seba newrozan
Seba biharan

3.12.1979

Institut kurde de Paris

# GOGA BER LÎNGAN

Her carê ez di sînoran re derbasdibim
Ez rêwîyên li pê xwe bêkêfdikim
Pêwanên sînoran
Li çavên min meyzedikin
Li guhên min meyzedikin
Li porê min meyzedikin
Kaxezên min di ser hev re
Radikin
Datînin
Dibin
Tînin
Tîp bi tîp
Lê meyzedikin, dixûnin
Ji min dipirsin:
Navê te çîye?
Karê te çîye?
Tu kîyê?
Tu ji kûyê...?

Erê xwendevanên gotinên min
Her car li ber sînoran
Ez dibim goga ber lingan
Goga ber lingên pêwan û rêwîyan

Her car li ber sînoran

Institut kurde de Paris

Xûna min dikele
Porê min qijdibe
Govdê min dilerze
Çavên min sordibin
Keser pirdibin
Ez ji xwe dipirsim
Ma ez dizim ?
    Ez rêbirim ?
    Ez mêrkûjim ?
Ma ez çime ?
Ma ez kîme ?

Pêwanên sînoran!
Win bi welatin
    Bi karin
    Bi navin
Win zanin win kîne
Win welatê xwe diparêzin
Ez bê navim
    Bê alim
    Bê welatim

Eger ala me heba
Eger ew jî tim bilindba
Eger welatê me welatê me ba
Serbilindba
Serbixweba



Institut kurde de Paris

Ne birîndar û bi kulba,
Li ber sînoran
Li pêşîya pêwanan
Ezê bibûma
Rêwîyekî ji rêwîyan
Ezê nebûma
Goga ber lingan
Sêwîyê ber destan

5.1.1980

Institut kurde de Paris

GULEK SEBA KONGRA KOMKAR

Dûrdibînan her digotin:
Rola karker wê were
Gornekolê axê kor û polperestê nokere
Îro hatin bi hezaran
Eve berga rêncbere

Ew ne xewn bû
   Ne xeyal bû
Vaye karker rêbere

Ev jî ne xewn û xeyale
Roja kurde tê dere

Ey hevalno...
Bona K o m k a r
Dil û can û cîgere

20.2.1980

Institut kurde de Paris

## EV ÇÎ ZÎMANDÎRÊJÎYE..

Bona dengkirnê..?
Rastda meyzeke
Gelek hevalin
Çepda meyzeke
Gelek hevalin
Pêşda meyzeke
Gelek hevalin
Şûnda meyzeke
Gelek hevalin

Werin em karkin!
Em gelek pirin..
Ev karê me ye..
Ev barê me ye..

Werin em karkin..?
Rastda meyzeke
Çepda meyzeke
Pêşda meyzeke
Şûnda meyzeke..heval namînin

Eva ser dêşe
Ewa pişt dêşe
Yê han nexaşe

Institut kurde de Paris

Yê dî bê kate
Yan jî nezane...

Erê hevalno..
Rastî wek roja l'
Nîvê ezmane
Derdê me giştan
Derdê zimane...

2.3.1980

Institut kurde de Paris

## BÎXÊRHATÎNA CEGERXWÎN
## ÇÎRA NEWROZA ME..

Tu di ser çavan ra hatê
Ey Cegerxwinê mezin
Tu ne kalê heyştê salyê
Tu nîşan û reçenasê miletê

Vane bindest tev şîyarin
Weke her dem te dixast
Li Kurdistanê jî vaye
Qeyda koldaran şikest

Berî pir salan te gotye
Serfirazî bi xebate
Îro karker jî şîyarin
Têkoşîn bona welate

Li Mehabada azadî
Cejna kurde b' serbilindî
Li Dîyarbekra ciwanî
Hate meydanê b' mêranî
Gelê kurdî..qehremanî

Vane Seyda bendewarin
Keç û xort û mêr û jin

Institut kurde de Paris

Tev dixazin j' te bibîsin
Doz û rewşa gelê me
Tev dixazin te bibînin
Ey çira newroza  me

2.3.1980

Institut kurde de Paris

## DİLÊ XWE XAŞMEKİN..HÊVÎ TUNE

Avê germbikin
Kirasê mirnê amadekin
Tevr û bêran bicivînin
Gorneke fireh..mezin
Li çarmedorê cîhanê bikolin

Nexaş kaban dikute
      Hustî xardike
      Berê xwe dide mirnê
Nexaş dixaze bimîne li dinê
      Derbaske tayên candanê
      Vegere serpêşîya dîlanê

Lê doktorên hemû welatan
Bi qentaran dermanên hemû rengan
Nikanin nexaşê piştşikî
                  Porsipî
                  Westî, dermankin
Ji çûndinê
Ji mirnê
Biparêzin, vegerînin

Çavên xwe vekin
Sermîyandarîya zingarî

Institut kurde de Paris

Devberjêrbûye
Dema wê çû derbasbû
Ciwan nabe
Venagere serpêşîya dîlanê
Hêvîmekin
Xwe naskin
Hêvîya we bê hêvîye

2.3.1980

Institut kurde de Paris

# BANGA JÎ DÛR..

Dîsan birîndar
Dîsan kuştî
Bê hejmar..bê hejmar

Bihara Mehabad şerjêdikin
Qurşîndikin
Bidarvedikin
Çarşîyên Senendec dikin golên xûnê
Rojê digrin bi balefiran
Bi barûta topan
Bi şewtandinan
Bi reşdûmanan
Li Seqiz..
Li bakur..li başur
Li her gelîyekî
Li ber her zinarekî
Li ser her bostekê ji Kurdistan
Kaseseran diçînin
Bê hejmar..bê hejmar...

Ey gelê bindest!
Dîsan rê mede axan..şêxan..melan
Xwefiroşan..xweperestan
Bila durû..derewkar
Nebin rêşanê te..rêberê te

Institut kurde de Paris

Ey gelê perîşan!
Tu xudî xak û dozî
Tu mafê xwe dixazî
Tu her dem qehremanî
Tu dîsan nola şêr û bazî
Tu ne dijminê mirov û gelanî
Tu belengazî
Tu ne şerxazî
Tu hevalê aştîxazî
Tu ne êrişvanî
Tenê mafê xwe dixazî
Lê mexabin bi sedan..
            Bi hezaran car
            Mexabin..
Dîsan..weke her dem
Bê rêxistin û rê û rêzanî

Ey karker û cotkarên Kurdistan!
  Roşenbîrên Kurdistan!
  Keç û xortên ciwan!
  Dayîkên şehîdan!
  Dayîkên birîndaran!
  Dayîkên birîndar û dilovan!
  Rê bigrin li îmamê bê hiş
                     Bê dîn
  Li bermayê zemanên pêşîn
  Li dijminên yekbûna "mustezefîn"!

Institut kurde de Paris

Ey gelê azadîxaz!
Şîyarbe..guhbide deran
Bişkîne çembera dijminan
Xwe dîsan meke goga ber lingan
Rîyên xwe mexe destên neyaran
Doza xwe dîsan meke gayê bazar û
Çarşîyan !!
Da em dîsan nekşînin keseran
Nerjînin hêstiran
Nebêjin:
Heyfa kaseseran
Birînên dayîkan
Xûna xort û keçan
Da em dîsan nebêjin:
Heyfa şêr û pilingan
Heyfa gelê qehreman..

4.5.1980

Institut kurde de Paris

## HATİM..STİRANA SERKETİN

Heval pêlên dilêm rabûn rabûn rabûn
Dan ser çîyan
Dan ser çîyan
Delal ne rêbirim
Dosta ciwan ne mêrkujim

Gupikên daran
Zarokên malan
Bi çavsorî qurşînkirin
Bihara welatê şêrîn
Lê delal birînkirin..birînkirin
Minalên biçûk sêwîkirin
Dayîkên dilgerm..diltîrkirin
Destên xort û keçan jihevkirin..
Jihevkirin..

Baran barî..barî..barî
Li bajar û gundan
Li ser çîyan
Baran barî barî barî tev agire
Tev agire
Xûn herikî -aştîxazên cîhan-
Lehîya sore
Lêmişta sore
Dijmin hatî..hatî..hatî dijminê kore

Institut Kurde de Paris

Dijminê bê hiş xudî top û tang û
Çekên gire
Xudî dare..
Xudî zore..

Delal kûre..kûre..kûre birîna dile
Hevalê gire..gire..gire barê mile
Gelê ber destan..
Sêwîyê ber deryan keser û kule..
Derdê dile

Namrim..namrim..namrim..
Dijmin namrim
Çîyayên girim
Feratê kûrim
Hebûn û dîroka dirêj û dûrim
Vame pênc hezar salin her li virim
Her li virim
Namrim..namrim..namrim
Xûnrêj namrim

Hatim..hatim..hatim
Ji birînan hatim
Hatim..hatim..hatim
Ji hêstiran hatim
Hatim..hatim..hatim
Ji derd û kulan..

Institut kurde de Paris

Ji keserên dilan..
Xêrxazên cîhan..hatim..hatim

Hatim..hatim..hatim...
Cîhan hatim...
Hatim..hatim..hatim...
Rojhilat hatim...
Dijminê xûnrêj...
Hatim..hatim...
Dostê rêya dûr û dijwar...
Dîsan hatim...

Mirov û gelim..bê nav nabim..
Bê mal nabim..
Bê al nabim..
Bi hustixarî, bi zordarî..
Bi qeyd û bendan, bi zîndanan..
Qayîlnabim..
Qayîlnabim..
Ji vir û wêda..
-Dost û dijmin..tev zanibin-
Bê deng nabim..
Bê deng nabim..

Rojhilata Navîn dilê te me
Bûka cîhan sîwarê te me
Zêr û zîvê destgirtê te me

Institut kurde de Paris

Bazara dijmin rizgarê te me
Rojhilata Navîn dîsa va  me
Hatim..hatim...
Rêzanê te me
Rojhilata Navîn..
Rêberê te me

22.5.1980

Institut kurde de Paris

## EGER...

Eger ez şûr bûma
Minê xûna şevê biherkanda
Eger ez çira bûma
Minê konê tarîyê bişewtanda
Minê fitîla xwe berda bîrên
Kerkuk û Batman û Rimêlan...
Ronahî bibira serê çîyan
Nav gundên li ber zinar û gelîyan
Li wir jî tarî xaçkira bi lingan
Û pişt û pîyan...

Eger ez xudanê Xabûr û Ferat û
Dicle bûma...
Minê bikirana kanîyên jîyanê
Bila dengê wan belavba li
Seranserê cîhanê...
Bila hejar û bindestên cîhanê
Kombana li dor dîlana Kurdistanê

Ez mirovim
Bi hêstirên zarokan
Dilê min dilerze
Bi keser û nalînan
Porê min qij dibe
Xûna min dikle

Institut kurde de Paris

Ez mirovim
Çiran vêdixim..geşdikim
Darên jîyanê diçînim
Baranên xêr û xaşîyê dibarînim

Ez mirovim
Bihatirim ji pêtrol û ğazê
Xurtirim ji sînorên li enîya
Ferat û Diclê...
Bîst milyon birînim..ji bîrnabim

Mirovim
Karkerê rêzanim
Gundîyê serbilindim
Ronakbîrê şoreşvanim
Mirovim..dilovanim
Dilketîyê tîrêjê rojim
Mizgîna xêr û jîyanim
Zengilê diwarojim

2.6.1980

Institut kurde de Paris

## DEMA ME..

Tu dema rakirna sînorayê
Tu dema çirandina kirasên mirnêyê
Tu dema hilweşandina zîndanayê
Te kanîyên tarîyê çikandin
Te çavên Fêr'ewnan korkirin
Te heyv û histêrk nêzîkkirin
Alayên azadî bilindkirin

Tu ne dema dizanî
Tu ne dema bazirganîya însanî
Tu dema asoyên geşî
Dema bihar û newrozên xaşî
Dema serketinên şoreşî

Dema me..em dixazin te bigrin
Te lîwankin
Hefsarê te di dest xwe kin
Bergehên şûnmayînê derbaskin

Em te bernadin
Em te bernadin
De pêşva!
Em bi hev ra pêşva!
Bê sînor pêşva...!

5.7.1980

Institut kurde de Paris

## DÛRÎ DİJWARE

Hêstirêm hatin
Ey dayîka min !
Dema dê û bavê Haydî[1] vêr hatin
"Here pêş Haydî"
Serketin xastin
Bi ken bi şadî
Dest jêr hejandin
Bi hêvîyên mezin
Bêçî guvaştin..bêçî guvaştin[2]

Hêstirêm hatin
Ey dayîka min!
Dûrî dijware bona dê û bavan
Birîna kûre l' dil û henavan
Barê girane l' milê mirovan

Hêstirêm hatin li pir der û cî
Dilê min kûre derya bê binî
Dûrî dijware hezar carên dî
Yê dûrî nedî
Derd û kul nedî
Derd û kul nedî

6.7.1980

Institut kurde de Paris

1- Haydî keçeka 16 salî bû. Di roja 6.7.1980 de telefizyon ew û lîskên wê nîşandan. Dê û bavê Haydî jî vêra hatibûn yarîgeha sport.
2- Guvaştina bêçîyan nîşana xastin û hêvîkirna serketinêye.

Kenê dê û bavê Haydî û hêvîkirna serketinê jêra hêstirên min herikandin, û min ev helbesta biçûk nivîsand.

Institut kurde de Paris

## EVÎNDARÊ SERKETİN

Xortek hebû..evîndar bû
Weke baz û pilinga bû
Evîndarê serketin bû

Netirsî j' ba û bahozan
Netirsî j' ceng û zîndanan
Xudî doz û evîndar bû
Evîndarê serketin bû

Li bin berfan û baranan
Li bin lêdana tîrêjan
Li nav pêlên kul û derdan
Li kûranîya tarîyan
Serbilind û çira geş bû
Evîndarê serketin bû

Li pişt deryan û sînoran
Li mêvandarîya xewnan
Li govenda xem û ahan
Helbestvan û evîndar bû
Evîndarê serketin bû

Institut kurde de Paris

Îro dîsa helbestvane
Weke her dem xudî doz û
Şoreşvane
Helbestvanê rêya dûre
Evîndarê serketina ala sore

11.9.1980

Institut kurde de Paris

# QEHREMANÊN BÊ NAV

Keçikên biçûk
Xûşkên şehîdan !
L'xwekin fîstanên cejn û şahîyan
Destan bidin hev
Herin nav baxçan
Komkin çîçekan, nêrgiz û rihan
Bidinhev gurzan
Ji gul û gupikan
L' cejnên newrozan
Bidin wan mêran
Pêşmergên kurdan, wan serbilindan
Azadîxazan, şêr û pilingan
Şêr û pilingan

Xûşkên şehîdan!
Wînin wan gurzan
Bidin ser gornên şêr û şehîdan
Bila şabibin daykin şehîdan
Bila ew bankin şêrên Kurdistan:

"Namrin win namrin
Win qet namirin
Mîna histêrkan win ronî didin
Mîna çîçekan win xaşbîn didin
Mînan baranan xêrê b' xwe r' tînin

Institut kurde de Paris

Eger win gornin
Sar û bê dengin
Bila dengbide bûka welatan
Welatê bindest, welatê kurdan
Bila Kurdistan bibe  gulistan
Bila nemînin neyar û zîndan
Bila her hebin cejnên newrozan
Bila her bijî gelê Kurdistan
Gelê Kurdistan"

17.10.1980

Institut kurde de Paris

## BENÊ KEVZÊ

Burjiwazê çûk
Ey benê kevzê !
Çend rûyên te hene
Çend rengên te hene
Çend zimanên te hene
Ey berbextê gewr û zer
            Sor û sipî
            Geş û tarî

Burjiwazê çûk !
Tu ne hevalî
Tu ne hevalê ji dilî
Tu heval û dijminî
Ey berbextê renge reng
Ey ne hevalê rengeheval

Devê xwe geşmeke
Pişta xwe xarmeke
Poz megîne erdê
Dest dirêjmeke..mehejîne
Destê lerzonek
Destê derewîn şûnda bikşîne

Institut kurde de Paris

Ez bi kenê te şanabim
Ji sozên te bawernakim
Bi beza te ya jîyankurt
Ez germnabim...
Destên xwe naxim destên lerzonek

Burjiwazê çûk!
Tu benê kevzêyê
Ez piştа xwe bi te girênadim

31.10.1980

Institut kurde de Paris

# DÛRBÛNA HELBESTVANÊ DİLTENİK

Rojekê mirov dûrdibe
Mirov çend keseran dikşîne
Dûrbûn dibe heyvek
Keser serî hildidin
        Sînoran derbasdikin
        Zincîran gezdikin
De ji min re bêjin:
Çend keser kişandine
Ew mirovê deh salin dûre
Ji bav û dayîk
Ji xûşk û biran
Ji komên merîyan
Ji heval û hevrêyan

Deh salin
Bêhna welat neketîye pozê min
Roja welat nedaye enîya min
Xemlandina çîyan nehatîye ber çavên min
Mija biharê şilnekirîye porê min

Deh salin dûrim
Ji dergûşa xewn û hêvîyan
Ji yarîgehên cejn û şahîyan
Ji newal û çîyan

Institut Kurde de Paris

De werin bihejmêrin keserên dilan
Temaşekin li pêlên derdan û kulan
Guhdarkin li çêrûkan
            Li xewnên rojan û şevan

Werin bibîsin evsanên
            Dildaran
            Dilketîyan
            Helbestvanan
            Diltenikan

10.11.1980

Institut kurde de Paris

# HELBESTVANÊ DİLTENİK

Ez evîndarim zeman
Ez helbestvanim zeman

Ne bi roj û neb şevan
Xew li min nabe mîvan

Ez evîndarim zeman
Ez helbestvanim zeman

Ax û ahînên dilan
Dame bin ling û daran
Helbestvanim
Helbestvan...

Ji kulîkan hezdikim
Ji gupikan hezdikim

Helbestvanê diltenikim
Xem û derdan komdikim...

Ez evîndarim zeman
Ez helbestvanim zeman

Lê derd û kulên welatan
Dane ser derdên dilan...

Institut kurde de Paris

Ew bi zincîr û benin
Bê sînorin, bê alin...

Ez helbestvanê wanim
Ez canfîdayê wanim...

Ez evîndarim zeman
Ez helbestvanim zeman

Lê j' neyaran ra neyarim
Bo şer û cengan şêrim...

Serbilindim leşkerim
Dûrdibînim rêberim...

Ez evîndarim zeman
Ez helbestvanim zeman

24.11.1980

Institut kurde de Paris

# NABLUS Û DÎYARBEKIR

Ez bala xwe didim kolanên Nablus
Kolanên Dîyarbekir
Ez kûr temaşedikim
Çavên xwe digrim, vedikim
Dîsa digrim, dîsa vedikim
Bi sedan car temaşedikim:
Gelo ev rastîye yan xewnan dibînim?

Bîyanîyên çekdar pir bûne
Kîne ev bîyanîyên şerxaz?
Çima destdavêjin pêsîrên mirovan?
Kulman li wan didin?
Kaxezên wan dipirsin?
Çima zarokan di hembêzên dayîkan da
ditirsînin?
Çima jin û mêran didin ber singîyan?
Çima pişta wan didin dîwaran?
Bi navê kîjan xudêyî ew xûnê dirjînin?
Bi fermana kê ewqas poz hildidin?

Nablus-Dîyarbekira jêr-
Ew çi dixazin?
Dîyarbekir-Nablusa jor-
Ew çi dixazin?

Institut kurde de Paris

Ez kincên bîyanîyên çekdar bêndikim
Bêhna laşên Tel-Ezze'ter dikeve
pozê min
Bêhna şewtandina zevîyên birincê
Vîyêtnamê dikeve pozê min
Di bin nênûkên wan da
rengê sor dibînim
Li ser tang û singîyên wan
"Made in USA" dixûnim

Dîyarbekira jêr
Ew dixazin
Tu navê xwe jibîrbikî
Bi zora zîndan û singîyan
Stêrka şeş serî bilindbikî
Rûyê xwe li ber rabîn û haxaman
di erdê kî

Nablusa jor
Ew dixazin
Tu turanli bî
Tu doğu bî
Ne paytexta Kurdistan bî

Ez li çar qozîyên cîhanê digerim
Eger çûkin, eger mezinin
Gelek hêvî û xastekên min çêdibin

Institut kurde de Paris

Lê li welatên talan û kuştinan
    Li nav bazirganîya mirovan
    Li nav gornên azadîxazan
    Li nav bîyanîyan, destdirêjan,
        Nênûk bi xûnan...
Tenê yek xasteka min heye
Ew jî şewtandina çekên
"Made in USA" ye.

28.11.1980

Institut kurde de Paris

## WERİN...EM BİGUHÊRİN

Eger em neguhêrin
Em nagehên karvana zeman
Em nabin bazê serê çîyan
Emê bimînin piştşikestî li ber
rêçik û rêyan

Werin, em biguhêrin!
Em destpêbikin bi birçîbûnê
Bi hebûn û tinebûnê!
Werin, em rakin ji meydanê
Dizî û talanîyê
Zordestî û bindestîyê..!
Werin, em bişewtînin tarîya nezanîyê
Bilindbikin minara xwendin û
ronahîyê!

Werin, em guhdarkin li dengê teze!
Da em rêya xwe zanibin

Bawermekin ji pirtûkên kevnar
Ji dojeya bê kenar
Ji bihuşta gul û dar!
Guhdarmekin li çîrokên sihr û dêwan
Li şûrên bi çel hirînan!
Biçirînin perdên fen û derewan!

Institut kurde de Paris

Werin, em rengan binasin!
Da em reş nekin sipî
Werin, em rêyan binasin!
Da em şaşî nekin rastî
Werin, em li zemanê xwe bibin mêvan!
Da em nemînin li pê karvanan
Werin, em bibînin lihevketina Rojhilat!
Da em baş binasin doza welat
Werin, em bibin karvan!
Da em biguhêrin derewan
Bi lez bigehên karvana zeman

Werin, em firehbikin binyat
Dermanbikin birînên welat
Zelalbikin lihevketina Rojhilat!
Werin, bê rawestan werin!

5.12.1980

Institut kurde de Paris

## ZENGİL LÊDİKEVE

Hevalên girtî!
Dengê nalîna we
Têye guhên me
Em zanin:
Win ne dehin
    Ne sedin
    Ne hezarin
Win sed carî hezarin
Û hên jî bêtirin

Hevalên girtî!
Ey leşkerên nenas!
Ey sedhezar hejmarê bin qirbacan!
Bibûrin
Ez we nasnakim bi navan
Bibûrin
Min sîngê xwe ji we re nekirîye mertal
Mertalê ber tîran û kulman
Bibûrin
Min destê xwe dirêjnekirîye derman û melheman
Bo birînan
Bo birînên bi sedhezaran

Institut kurde de Paris

Hevalên girtî !
Min çiqas dixast
Ez bibûma mûmek
Li tarîyên zîndanên we
Min çiqas dixast
Ez bibûma lîlîyek
Bihatama guhên we
Ez bibûma dilopek av
Parîyek nan
Têketama devê zarokekî we
Min çiqas dixast, di van rojên sar da
Ez bibûma êzingek ji perçedaran
Da min germbikira destên komkekê
Ji zarokên ber dîwaran
Ji çaverêyan
Ji sêwîyan
Ji bêmalan, bêxudanan

Hevalên girtî !
Min çiqas dixast
Ez pişta hovan bidim dîwaran
Bişkînim dest û lingên wan
Derînim çavên, şadibin bi xûn û
birînan
Bibirim zimanên wan "segan"
Min çiqas dixast
Ez şepqên ceneralan komkim

Institut kurde de Paris

Bihejmêrim
Bidimhev
Bavêjim ser serguyan

Hevalên girtî !
Ew xwendegehan dikin zîndan
Win zîndanan dikin xwendegehên
şoreşan
Ew tarîyê belavdikin
Win rojê dertînin
Ew tirsê diçînin
Win cîgera tirsê dişewtînin
Ew jîyanê dikujin
Win dara jîyanê avdidin
Ew govdên we birîndikin
Win birînên gelê bindest dikewînin
Ew gundan berbenddikin
Win welatan rizgardikin

Hevalên guhdar !
Xwendevanên gotinên min !
Tarîya zîndanên azadîxazan
Her tim kanîya ronahîye
Hejmara sedhezar jî pira azadîye
Werin
Em destan bidin hev

Institut kurde de Paris

Bibin perspanek
Bigrin tazîbûna zarokên girtîyan!
Werin
Em bibin desmalek
Paqijkin hêstirên jin û dayîkên
girtîyan!
Werin
Bi sedhezaran
Bi milyonan werin!
Werin
Em vî barî rakin
Tarîyê ji hev belakin!

4.1.1981

Institut kurde de Paris

## JÎYANA HÊSTÎRAN KÎNE

Ez nizanim
Ez ji xwe dipirsim:
Gelo gotinên min hoyên
Hêstirên minin
Yan hêstirên min hoyên
Gotinên minin ?

Gava ez dinivîsim,
Gotinên min nola komkên sêwîyan
Xwe didin pişt perda hêstiran

Li zivistanên sar
Bi daketina pepûlên berfê re
Bi harbûna bapeşkan re
Bi tarîya şevên dirêj re
Li havînên tîremaran
Bi bilindbûna roja sor re
Bi çîçekên hinaran re
Bi lalbûna erd û esman re
Li biharan
Li payîzan
Li danzdeh mehên salê
Ez guhdidim katjimara dilê xwe
Temaşedikim li pêlên hêvîyan
Digerim li rêya mizgînan
Dipirsim ji karvanan

Institut kurde de Paris

Ez baş zanim
Çerxa dîrokê nayê vegerandin [1)]
Ez baş zanim
Jîyana hêstiran kine
Ez baş zanim
Emê bi heyv û histêrkan re bikenin
Emê bi mija sibê şabibin
Emê evînê rizgarkin
    Newrozên serketinan pîrozkin
    Biharên cejn û şahîyan dirêjkin

Helbesta min !
Dost û yara min !
Şop û sîya min !
Katjimara emrê min !
Mebe komka sêwîyan !
Xwe rizgarke ji hêstiran !
Li her çar perçesalan
Li derdan
Li xaşîyan
Bibe ala dost û hevalan !

14.1.1981

1) Li ber vê malkê Cegerxûn di serrast-
kirnê da nivîsîye û gotîye:
"Na heval na
emê vegerênin".



Institut kurde de Paris

## RASTE RAST..BÊ SERGOTİN

Weke hevalên rast
Ramanên rast jî
Bi peran nayên kirîn
Li bazaran nayên dîtin
Ji esmên nabarin
Ji qadê tênazên

Bigerin li ramanên rast
Bipirsin ji têran
Ji birçîyan
Dakevin nav komên xas û tazîyan
Bixûnin defterên xeznedaran
Zanibin hejmara milyonêran
Vegerin li pirtûkên zanan û rêzanan
Têkevin nav pêlên dîrok û zemanan
Temaşekin li qesr û gornên şahan û Padîşahan
Temaşekin li qeyd û bendên dîlan û Rebenan
Binasin raperîna Spartekus û komên Bindestan
Bicivînin raman û gotinên rast
Eşkere..dizî li hev kombin
Bêjin gotinên rast

Institut kurde de Paris

Ramanên nayên gotin
Nayên çerxkirin
Ronahîyê nasnakin,
Mîna avên golan dimrin
Digemirin
Yan nola zêrên bin kevrên çolan
Dermannakin derdan û kulan

Alîgirên Spartekus û raperînan!
Komên dost û hevalan!
Xudanên gotinên rast û ramanan!
Bê westan û rawestan
Belavkin wan gotin û ramanan!
Bila nîşanbidin rêya histêrkan
Bila bibin mizgînên raperînan
Serketinan

14.1.1981

Institut kurde de Paris

## SPAS Û HÊVÎ

Gelek spasên ji dil bo hemû kesên di amadekirna vê dîwanê da beşdar dibin.

Hên ez heval û mirovên van helbest an dixûnin, didin xwendin û belavdikin jî pir spasdikim.

Di vir da bi taybetî ez mamosteyê mezin Cegerxûn gelek spasdikim bo arîkarî û têbînîyên xwe yên hêja di serrastkirna zimanê helbestan da.

Ez hêvîdikim ji heval û xwendevanan, ko bi gotaran yan bi nameyên xwe rexna helbestan bikin. Ewê bi be arîkarîyeka hêja bo min û bo hemû hevalên dinivîsin.

Di dawîyê da ez dixazim bêjim, tevî hemû dijwarîyan ez van helbestan çapdikim bi hêvîya, ko ev dîwana biçûk jî bibe mûmek li ser rêya serketin.. li ser rêya azadî.. li ser rêya rojên xaş...

Institut kurde de Paris

SERECEM

| | |
|---|---|
| Dîyarî | 1 |
| Pêşgotin | 3 |
| Bendewarim...werin | 18 |
| Rêya azadî | 20 |
| Mebê kanî lawê min | 22 |
| "Mafên mirovan diparêzin" | 26 |
| Polat tê avdan | 30 |
| Mafê mirov.. | |
| Kuştina Solomon Malangu | 33 |
| Îran..ya dawîya 1001 şev | 38 |
| Bo çi nalîn û girî..? | 42 |
| Eger min bigota: Ax... | 43 |
| Em dara jîyanê diçînin | 45 |
| Tu peydanebûyî ji bo | |
| bindestî... | 47 |
| Em ji hestî û goştin | 48 |
| Berdin bazirganîya derewan | 49 |
| Dijmin û birîna min | 50 |
| Goga ber lingan | 53 |
| Gulek seba kongra Komkar | 56 |
| Ev çi zimandirêjîye | 57 |
| Bixêrhatina Cegerxwin | |
| Çira newroza me.. | 59 |

Institut kurde de Paris

Dilê xwe xaşmekin..
hêvî tune 61
Banga ji dûr.. 63
Hatim..Stirana serketin 66
Eger 70
Dema me 72
Dûrî dijware 73
Evîndarê serketin 75
Qehremanên bê nav 77
Benê kevzê 79
Dûrbûna helbestvanê
diltenik 81
Helbestvanê diltenik 83
Nablus û Dîyarbekir 85
Werin...em biguhêrin 88
Zengil lêdikeve 90
Jîyana hêstiran kine 94
Raste rast..
bê sergotin 96
Spas û hêvî 98

Institut kurde de Paris

INSTITUT KURDE DE PARIS
ENTRÉE N°

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris
K.L.